

Ew kesê ku Dr. Qasimlo

şande Ewropa, ew jî hate


şehîdkirin

»»» R:7



Dr. Mihemed Sadiq Şerefkendî yek ji rêberên navdar ê kurd yê sedsala 20`î ye

»»» R:3



Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Giştî ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi
www.agirimedia.org Hejmar (382) 23-09-2020 Buha (1000) Tûmen

Hizr û ramanên ku ji bona çendîn nivşan dibine rêbaz

»»» R:5



Kurdiştan di navbera raporta NY û serdana nûnerê Amerîkî de

»»» R:8



Xebata bêrawestan ya gel zaminê serkevtinê ye

26`ê Xermanan ya îsal 28 sal bi ser terora Sekreterê wê demê yê PDKÎ, cihgirê kêrhatî û berheq yê şehîd Dr. Qasimloyê hertim zindî re derbas bû.

Di demeke reş de, û li paytexta welatê Almanayê, Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî Fetah Ebdulî, Humayûn Erdelan û Nûrî Dêhkurdî di rîstorana Mîkonosê û piştî amadebûn di 30`emîn kongereya Entirnasiyonala Sûsyalîst de, û di dema danûştandina digel çend aliyên Îranî bi mebešta hewildan bo çêkirina bereyeke yekgirtî ji opozîsiyona seranserî li dijî Komara Îslamî, raştî gulleyên şevpereştan hatin, û şehîd bûn.

Di dîroka mirovayeti de, hertim hebûne û hene hin kes yan kesane ku pêwendiyên xwe digel dinyaya derdorê bi tundûtîjî û gef û tirsandinê ber bi pêş ve birine. Jinavbirina fîzîkî wek bertekekê, nîşana tab û tehemulnekirina aliyê beranber, û herweha tabnekirina dîtingeh û daxwaziyên wan, û nîşana lawaziya şiyana lihevkerinê û pêwendiyên digel aliyê hember e.

Eva ku eşkere ye, û dîroka mirovatiyê vê yekê tîne bîra me, eva ye ku sirûştta mirovayeti tîkelîyek e ji zêdexwazî, deşhilatxwazî û heştta rikeberiyê, û ew taybetmendî ne, ku wisa dikin ku mirov li pey bideştveanîna deşhilatê, û paraştina deşhilatê, û nîşandana deşhilatê be.

Gelek caran di vê pêxemê de jî, ji rewşên naexlaqî û nesiyasî jî mifahê werdigrin, û hawara xwe dibin ber her kiryarekê, ku digel

xwaşt û berjewendiyên wan yek bigre. Dema bideştvegirtina deşhilatê ji aliyê mirovekî ve, ku ji her cure nirxeke mirovayetiye bêpar e, dibe mebeşt, êdî girîngiya çawa bideştveanîna deşhilatê kêmrang dibe, û sextekarî û kuştin û çewtekarî û tawan û talan dibe emrazek bo gihîştin bi wê deşhilatê.

Di wê rewşê de xwediyê deşhilateke wiha narewa, bi armanca paraştina deşhilata xwe amadehiya vê yekê heye, ku vijdan û nixên mirovî bînpê bike, û li ser wê mijarê mijûlî afirandina rewşa gefan û tirsandinê bibe, û yek ji wan rewşên tirsandinê, paşekêşîpêkirina cudabîran, rexnegiran û neyaran, ku ew li dijî dijberên deşhilata xwe bi kar tîne, jinavbirina fîzîkî an jî terorkirin e.

Eva ew senaryo ye ku di reştûrana Mîkonos a Almaniyayê de bi rê ve birin, û berî wê jî, di bajarê Viyen a Otrîşê de bi rê ve çûbû, ku wekî zaf caran, hevalên Dr. Şerefkendî pêdegiriyê li ser dikin, û yek ji serekîtirîn sedemên terora Mîkonosê ew yeka bû, ku piştî terorkirina "Dr. Qasimlo"

di 13`ê July 1989`an de, Dr. Şerefkendî rêberatiya PDKÎ girte stuyê xwe, her çend ku terora Dr. Qasimlo xisareke mezin bo gelê Kurd bû lê, di wan rojên zehmet û dijwar de, Dr. Şerefkendî bi rêberiya biwec û hêjatiya xwe karî hêviyê di nav refên PDKÎ û di nav xelkê Kurd de biafirîne, û ji wê zêdetir, hemû hewlên xwe bona avakirina eniyeke hevkgirtî ya xebatkar di asta seran-


bikerên teroran bixwe heye, û ew armanca ku di pişt terorê de hebûye, bi giştî nagihîne encamê, û bo wan naçe serê, mînaka berçav a wî jî teror û şehîdkirina hemû cureya rêberên tevgera Kurd e ku ew hemû armancên di pişt teroran de hebûn ku îşare pê hate kirin, lê ma ew tîxeya 2 alî dikarî heta dawî li deştê dîktatorên Îranê de bimîne? Ma karî bi wan kiryarên gemar te-

bi encameke dilxaz negihîbe, lê hate dîtin ku dosyeya Mîkonosê, û tawanbarkerketina Komara nezan û Îdamê, bi terorîzma dewletî derheq hevweletiyên xwe, bû sedema rezîlbûna navnetewî ya komara Îslamî. Ji aliyekî din ve jî, pirseke girîng a din heye ku dibe îşare pê bikin ev e ku tevgera Kurd, ne tenê her neşikeşt, belkî agirê xebat û xweragiriya wê zêdetir geş bû, û şoreş bi germî û agirekî zêdetir jî berdeham bû, û hizra pûç a terorîştan ku wa hizir dikirin bi jinavbirina fîzîkî ya rêberên Kurd dikarin rêvîngiya dîrokî bo berjewendiya xwe biguherînin û pûç bikin.

Di 28`emîn salvegera terorkirina rêberê mezin yê gelê me, Dr. Sadiq Şerefkendî de, em dibînin ku nav, bîr û yad û rêbaza wî egîdî, bilind û mezin e, herçiqas ku terorîştên Komara Îslamî her wek mirî dijîn, û bi tenê şerm û şermezariya dîrokê bo wan maye.

Belgeya nîşanderê vê gotinê jî ev e ku, ji aliyekî ve berdehamiya rê û rêbaza wan, çî di nava hevsengerên wî di çiyayan de, û çî ji aliyê rêvîngên rêbaza wî yên di çeperên bajaran de, ku di demsala xem û xemdariyê de, bi çalakiyên curbicur û bê guhdan bi gefan û rewşa tirsandina zêde, bi bîr tînin, û waneyên wî wekî xwendengehekî raşt bi bîr tînin, heta di dijwariyên rêya xebatê de, tûşî şaşî û ji rê derketinê nebin.

Bîr û yada "Şehîdên Mîkonos" û tev şehîdên PDKÎ û gel, bilind û birêz be



serî de bi kar bîne, ku ew, bû sedema ketina tîrsê di nav dilê dujminên azadiyê, lewma ew teror kirin. Lê bê guman, teror paşketên xirab bo

vgera Kurd bişkênin? Renge berjewendixwaziya aborî ya hejmarek ji deşhilatadaran rêgirî kiribe ku serweriya yasa û rewşa mafxwaziya aliyê zulmlêkirî

Sergotar

Bo çî qurbaniyan dixwazin?

N: Kerîm Perwîzî

Ferman dane ku kesekî/ê bikujin û xwîna wî/ê birêjînin ser axê. Ev fermane, ne nû ye, û ne yekem ferman e, belkî fermaneke berdewam e ku di roj, meh û salan de, dubare û 100 bare û 1000 bare bûye.

Ji dema ku deştilata Kolonyalîstî ya Tehranê deştilat girte deştê xwe, û netewên hundirê cuxrafîyaya belalêdayî ya Îranê bi şikeştîwarîyên şer dizanin, dibine xanexwêyê şîva xwîne, û wan talanan dikin, Tehran bûye fermana îdam û gullebaran û Kurdistanê jî bûye berxê qurbaniyê yê xevn û xeyalên cejn û mêvandariya dagîrkeran. Qurbanîkirin bona têrkirina xwînmîjîya hakimên deştilatdar e ku tînîtiya wan tenê û tenê, bi xwîne dişkê.

Serokên Kolonyalîst yê Tehranê, çî bi tanc û çî bi "mendîl" û çî bi putîn û çî bi kiravatê, dema çav bi Kurdistanê dikin, tinê û tinê wekî dujmin mêze dikin ku herdem jê bêxem bibin, û guh nednê, êrîşî ser koşkên wan yê derevîn dikin û wan dişevitînin.

Ji ber vê tîrsa kûr e ku, bi berdewamî serkut û tîxa xedrê bi ser Kurdistanê de radigrin, û herdem hewcehî bi çavtirsandina xelkê din yê Îranê hebin, dubare deşt dibin bo nav Kurdistanê, û kesekî hildibijêrin û dikin qurbanî, heta tîrsa xwîndîtina çavên navendnişnan kêm bike, û yê din jî bitirsin û li dijî rejîmê çalakiyan nekin. Ev kiryarên wiha û ew cure dîtingeha li hember Kurd û Kurdistanê de, zêdetir ji 100 salan e ku berdewam e, û Komara "Wilayeta Feqîh" gelek

Bi hilkefta 28emîn salvegera terorkirina Dr. Sadiq Şerefkendî, PSK daxuyaniyek belav kir

Bi hilkefta 26ê Xermananê 28emîn salvegera terorkirina rêberê navdar, Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî di welatê Almaniyayê de ji aliyê rejîma terorîst a Îranê ve Partiya Sosyalîst a Kurdistan (PSK), daxuyaniyek belav kir

Deqa daxuyaniyê bi wî awayî ye:

28 sal berê niha, Sekreterê Giştî a Hizba Demokrata Kurdistanê Îranê (HDKÎ) "Dr. Sadiq Şerefkendî" li Berlînê paytexta Almaniyayê kete ber êrîşa terorîstên ser bi Komara Îslamî ya Îranê û digel du endamên tekoşer, rêvîngên rêbaza Pêşawa Qazî, Fetah Abdulî û Humayun Erdelan şehîd bûn.

"Dr. Seîd" paş şehîdkirina "Dr. Qasimlo" bibû Sekreterê Giştî û ketibû bin barekî gelek giran. Dr. Saîd hevrêyê dilsoj û dêrîni Şehîd Qasimlo, rêvîngê rêbaza Pêşawa û şehîdên Kurdistanê bû û digel hevalên xwe yê serokatiya HDKÎ nehiştin alaya xebata Qasimlo bikeve erdê û paş şehîdkirina Qasimlo bêhêvitî û belavbûnê di nav rêza xebatgerên HDKÎ da belav bibe.

Dr. Seîd jî her wekî şehîd Qasimlo girîngî dida xebata demokrasî û hevkarîya hêzên demokratên Îranê û di civînekê de, ku bona vê armance hatibû amadekirinê, kete ber êrîşa terorîstê û bûye yekek ji serkêşên karvana



şehîdên Kurdistanê.

Dr. Seîdê akademîsyen û nivîskar her wisa gelek girîngî dida hevkarîya hêzên her çar parçeyên Kurdistanê û dostê dilsojê partiya me bû.

Em carekî dinê terorkirina Dr. Seîd û hevalên wî ji aliyê rejîma Komara Îslamî ya Îranê ve mahkum dikin.

Em piştraşt in û heya îro hatiye selmandin, ku hevsengerên Dr. Saîd alayê xebata wî hertim bilind ragirin.

Dr. Seîd û hevalên wî û hemû şehîdên Kurdistanê nemir in, riha wan şad be.

16 Îlona 2020

PSK-Partiya Sosyalîst a Kurdistanê

tundtir û hovanetir ji yê berê bi rê ve dibe.

Dema ku kesekî wek "Heyder Qurbanî" di nav xelkê Kurd de binçav dikin, û tohmetekê lê didin, êdî bo wan girîng nîne ku ew tohmet raşt e an ne, û heta hekî karek jî kiribe, gelo pêka yasayên wan yê dijemirovî, cezaya wî bi qasî karê wî ye an ne?

Bo wan "Heyder" girîng nîne, belkî qurbanîbûn girîng e. Ew "Heyder" bi tenê bona qurbanîkirinê dixwazin, heta ku çend miftexwarên xwe di Kurdistanê de razî bikin û hem tînîtiya xwe bişkînin, û hem jî xelkê din bi dîtina xwîne çavtirs bikin.

Renge çend hevpiyaleyên "Weliyê Feqîh" ku li aliyê xwarê yê sifreya hikûmetê de mijûlî xwarina xwîna qurbaniyan bin, hêceta vê yekê bo rejîma dagîrker wekî rejîma Îranê bînin, û bêjin ji ber vê yekê ku Kurd berevanî ji xwe kiriye, lewma asayî ye ku rejîm jî xwîna wan birêje, lê her hizreke azad û îradeyeke berxweder dizane ku "Heyder" tinê û tine, bi tawana Kurdbûnê dikin qurbanî.

Dr. Mihemed Sadiq Şerefkendî yek ji rêberên navdar ê kurd yê sedsala 20`î ye



N: Elî Munezemî

Dr. Sadiq Şerefkendî li Rojhelatê Kurdiştanê, di bajarê Bokanê, li himbêza malbatek welatparêz û netewehez de hatiye dinê. Ew li zarokatiyê de bavê xwe ji deşt dide û erkê serpereştî û mezinkirina wî dike ser milê birayê wî yê mezin, an ku helbestvanê navdar ê kurd- Ebdulrehman Şerefkendî wate «Mamoştaya Hejar».

Mihemed Sadiq Şerefkendî tenê 2 salan çûbû dibistanê dema ku malbata wan li Bokanê bardike û diçe bajarê Mehabadê, damezrandina komara Kurdiştanê û zaf bûyerên din yê dîrokî dibîne. Ew li bajarê Mehabadê xwendina deştêkî û navendî dawî tîne. Mihemed Sadiq Şerefkendî sala dawî ya paşnavendiyê li Tewrêzê de bidawî tîne û bo xwandina bilind diçe Tehranê û di sala 1959an li zanîngeha Tehranê de lîsansa kîmyayê werdigre. Ew piştî wergirtina birwanameya xwe ya lîsansê, dibe mamoştaya û di bajarê Urmîye û Mehabadê de xizmeta mamoştayetiye dike. Ew wek mamoştayek dilsoz, lêzan û şareza xizmetên mezin bi xwendevanên kurd dike û di xema serkevtina wan de bû ku di zanîngehan de bîne wergirtin, zehmetek zêde kişandibû û li ber wê yekê jî, wek mamoştayek jêhatî navê wî di nava xelkê de belav bibû. Piştî rejîma dagîrker a Pehlewî, wî di sala 1968an de li Rojhelatê Kurdiştanê dûr dixe û zarokên kurd li wî mamoştayê zana bêpar dike.

Mihemed Sadiq Şerefkendî di sala 1970'an de ji bo zanîngeha "Terbiyet Moelim"ê hate şandin û weke asîstanê beşa kîmyayê kar pê hate spartin. Piştî nîşandana jêhatîbûna xwe di wê erkê de

sala 1972'an bi mifahwergirtin ji borsiyeya Wezaretê Zanîstê çû Firansayê û piştî mana çar salan li wî welatî de karî pileya duyemîn di Kîmyaya analîzê di zanîngeha hejmarê şeş a Parîsê de werbigire. Navbirî piştî wergirtina pileya duyemîn ya Duktoreya xwe dizivire Îranê û di zankoya "Terbiyet Moelim" de dibe mamoştayê alîkar û dixebite. Ew di nava xwendekaran de wek mamoştayek xebatkar navûdengê xwe derdixe.

Jiyana siyasî ya Dr. M. Sadiq Şerefkendî

Şerefkendî wê dema ku di Parîsê mijûlê xwendina xwe ya duktorayê bûye, ji aliyê rêberê mezin Dr. Ebdulrehman Qasimlo ve tê vexwandin bo nav refên PDKÎ. Ew piştî pêwendiyên xwe bi Dr. Qasimlo re û xwendina bername û peyrewa hundirîn a PDKÎ biryar dide ku tevî refên partiyê be û di sala 1973an de di wê partiyê de dibe endam. Navbirî piştî dawîanîna xwendina xwe û wegeriyana bo Îranê, dibe helqeya pêwendiyên di navbera Dr. Qasimlo û endamên berê yê rêberiya PDKÎ ku di Rojhelatê Kurdiştanê û Îranê de dijîyan.

Qonaxa bi bandor a jiyana siyasî a Şerefkendî di piştî şoreşa gelên Îranê û hiloşîna rejîma Pehlewî deşt pêdike. Ew di sala 1979an de wek şwêrmendê komîteya navendî a PDKÎ û di kongireya 4 ya partiyê de jî di sala 1980an de wek endamê komîteya navendî tê hilbijartin ku navbirî wê demê wekî endamek nehênî yê Hizbê li Tehranê bû û wekî endamê Komîteya navendî jî hatibû hilbijartin. Gava ku rejîma Xomêynî hate ser kar û bi dijî kurdan fitvaya "cîhadê" da, Şerefkendî bo karê hizbê li ser daxwaza rêberiya partiyê wegeriya Kurdiştanê û piştî jî wek endamê deftera siyasî erkê xebatê li asteke herî bilind de kêşa uştîyê xwe.



Ew di hemû kongireyan de heta dema şehîdbûna dr. Qasimlo di 13ê Tîrmeha 1989an de, wek endamê komîteya navendî û di nava endamên komîteya navendî de jî wek endamê deftera siyasî dihate hilbijartin. Ew di sala 1986 heya dema şehîdbûna dr. Qasimlo ew weke cêhgirê sekertêr dihate hilbijartin û piştî terora Dr. Qasimloyê mezin jî, bû sekerter û kesê yekemîn ê PDKÎ.

Kesayetiya dr. M. Sadiq Şerefkendî

Şerefkendî di dema rêberiya dr. Qasimlo de, yekek li heval û piştevanê herî bihêz yê bername û siyasîyê dr. Qasimlo bû di serxistina bername û pîlanên dr. Qasimlo di nava refên partiyê de û zehmetek zêde dikşand. Ew berpîrsê çapemenî û Radyoya dengê Kurdiştanê bû û di formolekirin û propagandê bo siyasî û hizrên partiyê û dijberiya rejîma melayan û dijminên kurdan de rolek mezin hebû û bi lêzanîna xwe, ew kar û erkê giran mudîriyet û di pratîk de bi rê ve dibir.

Şerefkendî herwisa rêberek neteweperwer û welathez bû. Xebata wî ya siyasî, pişkek bû di pêvajoya netewesaziya kurdan. Wî bi berpîrsayetiya xwe di pişka çapemî û radyoya dengê Kurdiştanê de, li hêlekê xizmet bi paraştin û bilindkirina asta ziman û çanda kurdî dikir û di hêlekê din de jî bibû sedemê vegeşiyana heştaya neteweyî û çêbûna

hevsoziyê di nava gelê kurd de, û xwedî derketina kurdan li ax û ava welatên kurdan û fêrbûn û zanîna dîroka gelê xwe. Wî bi nivîsîna kurte dîroka bizavên netewî, demokratîk a kurdan, cehd dikir ku bide zanîn ku bo serkevtin û paraştina Kurdiştanê, dibe kurd yekgirtî û xwediyê partî û saziyên siyasî û sîvîl yê neşîretî bin. Wî di nava şoreşê û di pêvajoya netewesazî û xebata azadîxwazî de jî taybetmendîya xwe ya herî berçav, an ku mamoştayê, paraşt. Wî di serdemekê de ku netewexwazî bi şerm û eyb dihate zanîn, bi şanazî û serbilindî kurdayetî dikir û li berçesplêdana girûpên çep neditirsiya ku kurdayetî bi paremayî dihesibandin. Herwisa bêçine nebû ku naznavê "Seîd Bedel" dabûnê.

Aliyê bihêz ya rêberiya Dr. Sadiq Şerefkendî li piştî şehîdbûna dr. Qasimlo de bo doşt û dijminan derket. Wî bi şiyar û lêzanîna xwe, daye eyankirin ku ew layiqtirîn û jêhatîtirîn kes e bo cihgiriya rêberek mezin û navdar wek dr. Qasimlo. Wî karî hevî û umîdek mezin li cem xelkê Kurdiştanê, kadr, pêşmerge û alîgirên partiyê û hemû doştên gelê kurd çê bike û bi ti awayekê nehêla ne bê Qasimloyî bi partiyê ve xuya be û ne jî xebat û berxwedana partiya dr. Qasimlo jar û lawaz be.

»»»» Doma R:3

Eger em bi kurtî karakterê kesayetiya wî rêberê navdar bas bikin, em dikarin bibêjin ku: Dr. Şerefkendî rêberek jîr û zana, jêhatî, cesûr, lêzan û bidil û cerg, birêveberek layiq û xemxwarê gel û welatê xwe bû. Wî di rabûn û rûniştina tevî heval û hevçeperên xwe de sade û di birêvebirina kar û xebatê de micid, demnas û dijî tembeliyê û xwe vedizîn li kar, bo pêşmergeyan mamosta û xweştevî bû. Wî di xebata siyasî de, li ber hebûna pileyek bilind a zaniştî, xwediyê şarezayî û şiroveyek realîstane bû ku bûyer bi hûr û kûrî lêkdidan û kartêkeriya wan li ser pirsên cîhanî, Rojhîelata Navîn û xebat û çarênivîsa gelê kurd û têkoşîna wî gelî bo dêmokrasî û mafê neteweyî analîz dikir. Ew yek ji wan kesan bû ku her gelek zû kakila terrorîstîbûna rejîma Îranê û rejîma Xomêynî nas kiribû û di gotin û nivîsînê xwe de ew rejîma, bi rejîma terorîstî ya navneteweyî, dijî mirovî û dijî kurd û Kudiştanê, derevîn û xapînok dida nasandin. Şerefkendî di wê baweriyê de bû ku li her cîyekê dinyayê eger bo rejîmê çêbe, yê tede karê terorîstî bike. Şerefkendî gelek zû pîlanên dijmin dixwandin û li hember de xwedî bername û helwêst bû. Li ber hindê jî dijmin qet nekarî di meydana sereke ya xebatê yanî li Kurdiştanê de, tiştêkê bine serê wî. Şerefkendî bo dijmin kesek bi sam bû. Tirs û xof dixiste dilê wan.

Dr. Şerefkendî kesek bi prensîp û demokratek bi bîr û bawer bû. Wî di dema herî dijvar de jî ew prensîpên ku bawerî pê hebû, diparastin û bin pê nedikir. Wî demokrasî bi kite rêka çareseriyê pirsgrêkên siyasî û civakî dizanî. Wî jî her wek Dr. Qasimlo baweriyek kûr bi aştiyê hebû; Aştiyek erênî. Wî digot: "Aştî di dinyayê de tenê bi aştî û pêkhatina di navbera dewletan de pêknayê. Jiber ku hikûmet hemû demê nûnerê rastîn yê xelkê

welatê xwe nînin."

Duktur Şerefkendî dost û dijminên xwe bi başî nasdikirin. Wî hemû deman cehd dikir ku serxwebûna partiya xwe di biryardanê de biparêzin û qet îzin neda ku kesek bi navê dostayeti, destbêxe nav karûbarê partiya wî. Herwisa kesek rik û rast bû û gotina xwe eva ku pêdivî ba, di cihê xwe de digot.

Şerefkendî kesek bi rastî sadiq, mamosta û xemxwarê gel û welatê xwe bû.

Şehîdbûna dr. Şerefkendî

Şerefkendî ku bo lihevnêzîkirina tevgera kurdan li hemû parçeyan de û lihevnêzîkirina hêz û kesayetiyên Îranî bo çêkirina altiernatîvekê bo rejîma Axûndan, xebatek berfireh dest pêkiribû û bi çalakiyên xwe, dijmin xistibû tengasiyê. Dijmin jî gava ku dît li ser çiyayên Kurdiştanê nikare wî şehîd bike, kete dariştina pîlanên nemerivane û bi darêtinê pîlana terrora wî, karî şûnpê Şerefkendî li Ewropayê hilbigre û li dema pişkdariya wî di civîna Enternasyonala Sosiyalîst de li Berlînê, di hizra şehîdkirina wî de bûn. Wan karî di dema civîna Şerefkendî bi hindê kesayetiyên Îranî re, wî li Rîstûrana "Mykonos" ê, di 17. Îlona 1992an de tevî 3 hevalên wî bi navên: Fetah Ebdulî, Humayûn Erdelan û Huseyn Ehmedî (Naskirî bi Nûrî Dêhkurdî) şehîd bikin. Şerefkendî di dema şehîdbûna xwe de 54 salî bû.

Li destpêka bûyerê de Îranê înkara encamdana wê terore kir. Lê partiyên kurd, opozisiyona Îranî û polisên Almanî û bîrûraya giştî her li destpêkê de şika wan li ser rejîma terorîstî a Îranê û rêkxistina wan ya sîxurî a "tilaatê bû. Jiber ku Kurd bo mafê xwe yê neteweyî dixebitîn, ji aliyê dewletên dagîrker ve wek dijminên hesibandin. Dijminên kurdan li çî rêyekê bo kuştina rêberên kurdan, dest naporêzin. Di bûyera terorîstî di ristûrana "Mykonos"ê de, 3 ji wan qurbanîyan demûdeşt hati-



bûne şehîdkirin û yê 4an jî di rêka nexweşxaneyê de canê xwe ji dest da. Şehîdbûna wan bi wî awayî, ji aliyê her kesek xwedî wijdan ve bi kuştinek nemerivane û nemêrane hate hesibandin. Merivkuj û terorîstên Îranî û Lubnanî yên ku hatin girtin û di wê bûyerê de dest hebûn, ev in: "Kazim Darabî, Abbas Rahil, Yûsif Emîn û Mihemed Etrîs û Etaullah Eyad. Di dirêjiya jêkolîna polis ji çawanîya wê terore, Eyad semxatirê hevkarîya bi polisyan re, her zû hate berdan.

Di wan salên dawiyê de, terorîstên din jî hemû hatin berdan û zivirîna Îran û Lubnanê. Lubnaniyên ku di wê kiriyara terorîst de beşdar bibûn endamê Hizbullaha terorîst a Lubnanê bûn. Gava ku ew terorîstên Îranê hatin girtin, dadgehê li Alman bi navê «dadgeha Mykonos»ê pêk hat. Wê dadgehê ku pitir li 3 salan dirêjî kişand, di 10ê Avrîla 1997an de, rejîma Îranê di aştî herî bilinde deshilatê de bi biryarderê wê terore da nasandin. Salek beriya derçûna wê biryara dîrokî, an ku di 1996an de hikmê girtina Alî Felahiyan derçûbû.

Îranê gef xwarin û dixwaşt bi her awayekê rêgir be li derçûna biryarê li dijî Îranê û rêberên rejîma terorîstî a Îslamî. Lê dadgehê rêberiya rejîma Îranê di aştî herî bilind de sûçdar zanîn.

Piştî derçûna hikmê dadgehê, Îranê cehd kir ku nehêle ew biryar kartêkeriyê li ser pêwendiyên di navbera wan û welatên Ewropayî de danê, lê serneketin û eger bo demkî be jî, 15 welatên Ewropayî baliyozên xwe li Îranê wekişandin û balyozên Îranî jî derêxistin.

Elî ekberê Wilayetî Wezîrê Derve yê wê demêye rejîma terorîstî a Îranê, , pêş derçûna wî hikmî gotibû: "Alman nabe wa hizr bike ku ew hikm yê dinyayê seranbin ke.» Wan bi propagandayên derevîn dixwaştin nîşan bidin ku mehkeme bi armanca siyasî bi rê ve diçe. Lê di dema lêkolînan de belge hatibûn peyda kirin ku şûna tiliya merivkujan li ser çek û maşînê hebû. Dadgehê selimand ku Darabî efserê sîxurî yê dezgaha ewlehiya Îranê ye ku bi hevkarîya Hizbullaha Lubnanê ew cinayete kirine û biryar jî ji aliyê komîteyek taybet ku Refsencanî, Wilayetî û Xamineyî jî tê de endam in, hatibû dan. Şehîdbûna Şerefkendî û hikmê dadgeha «Mykonos»ê rejîma cinayetkar a Îranê risva kir û bo çendsalekan karî maşîna terorîstîya Îranê li Ewropayê bide sekinandin. Lê xuya ye ku terorîstbûn li xisletê hertimî ya wê rejîmê ye û bê afirandina cinayet û terore nikare bijî. Dîsa her li ser rêbaza terorîstîya xwe berderwam e.

Hizr û ramanên ku ji bona çendîn nivşan dibine rêbaz



N: Nûredîn Sofizade

Gelek kes di heyamê jiyana xwe de bi kar û kiryarên xwe, bi lêzanîn û bandora xwe bo ser kesên derdora xwe, yan bi pisporiya xwe ji yek ji warên jiyanê, weke siyasî, civakî, akadimî, alimî, egîtî, pisporî, rêberî, di nava civatgehê û kesên derdora xwe de dibe mînak û hinek caran dibe kesekî karîzmatîk û yan dibe rêbaz û hêla hizrî bo çendîn nivşên piştî xwe jî, û bi nemana wî kesî di jiyanê de, rolê wî dawî pêneyê, belkî dibe rêbaz û hizra wî yan berhemê ku piştî xwe bi cih hêlayî, dibe çiraya ronahiyê bo berdewamiya wê hizrê.

Di nava gelê me da jî, kêmnînin kesên ku bi hizra xwe yan berhem û keda xwe, yan rolê berçav a xwe di yek ji warên jiyanê de bandor hebûne û navê wan bi mezinî hatiye tomarkirin û bûne rêbaz.

Bi taybetî ku gelê Kurd bi dirêjahiya dirokê, hertim di nava xebatekî dijwar de bûye, bona man û hebûna xwe û bona rizgariya ax û bideştvegirtina qedera xwe xebat kiriye, ji ber evê ku renge di nava gelekê de ku dewleta xwe çinîne û serbixwe nîne, tenê kes û gernas û rêberên ku rolekî baş û berçav û erênî di xebata rizgarîxwazane de hebin, ji hemî kesên dinê zêdetir navê wan dibe ebedî û zindî nav dimînin, û gelê kurd xwe qerdarê ked û rolê rêberîkirina tevgêra ku wî rêberiya wê kiriye bizanin.

Lê dema di nava wan xwedî rol û rêberên xwedî bandor de, ji bilî bi heybetbûna wan

di dema rêberiyê de, karîbin piştî nemana wan jî, hizr, kar, rol û bandora wî bo kesên dirêjî derê rêka wî re dibine wane û “ulgo”. Hingê ye ku mirov dikare bêje hizr û karê wî rêberî bûye rêbaz û berdewam e, û kesên piştî wî şanaziyê bi vê yekê dikin ku bêjin em domderê hizr û rêbaza rêberê xwe ne.

Yek ji rêberên ku bi mudîriyet û lêzanîn û hizra xwe, di tevgêra rizgarîxwaziya Kurdistan di Rojhilatê Kurdistanê de, îro rojê piştî nemana xwe jî bûye rêbaz û weke navekî hertim zindî dimîne, û hizir û rola wî niha jî bo domderên rêbaza wî weke çiraya ronahîker a rêka xebatê ber rêvîngên wî ye, ku ew jî Dr. Mihemed Sadiq Şerefkendî ye.

Hizir û raman û pîlanên Dr. Şerefkendî, rolê wî di nava xebata Rojhilat û bi taybetî sergêriya PDKÎ de, mirov dikare bêje renge li ber mazintahî û hizir û rolê Dr. Qasimlo xuya nebû.

Dr. Şerefkendî her di dema rêberiya Dr. Qasimlo de jî, barê giran ê birêveberî, mudîriyet, û sergêriya PDKÎ zêdetir li ser milê wî bû. Ew rêberêkî bê îdi' a û xakî û pirkar, mudîr û micid bû, wî pênasaya taybet bi xwe bo mirovê şoreşvan hebû, ew bi dijî tenbelî û xwe vedizîna ji kar bû, wî jêvebû ku şoreşgêrdibe derwest şoreşgêr be. Renge kêman hatibe baskirin, Dr. Sadiq jêvebûye ku mirovê şoreşvan li ber hindê çepera şoreşê girtiye bera xwe ku, amade ye can û mal û xweşiya jiyana xwe fîdayê rizgariya gelê xwe bike, lewma ew di ser wê bawerê bû ku şoreşvan “Pêşmerge” dîr be ji rehetî û xweşî û nêzîkatî li jiyana bajarên û jêvebûye hekî mirovê şoreşvan kevte fikra jiyanê û dabînkirina îmkanatên jiyanê, bê guma ruhiya wî ya fîdakarî û şoreşvanî lewaz dibe, û zêdetir dilê wî bi jiyana xwe dibe.

Dr. Şerefkendî li ser wê bawerê bûye, ku ji bona xebata

rizgarîxwazane ya netewa kurd, tenê bes nîne ku hinek kesên şoreşvan û xwedî heşt, xwe erkdar bizanin bona encamdana xebatê, belkî hewce ye ku, her takekî Kurd ku xwe bê maf dizane û jêr deşt e û dilê wî bo azadiya netewe û niştîmana wî lêdide, bi her curekê ku ji deşt bêt û gorî îmkan û derfetê, dibe xwe erkdar bizane bo xebatê û beşdariyê bike û tenê bi çavê rizgarîder bera xwe nede pêşmerge.

Lewma Dr. Sadiq li ser wê baweriyê bûye, ku ji bilî birêvebirina erkê şoreşê, erkeki dinê jî dikeve ser

tanê bilind bike, her lewma bû ku berdewam ew şîret tîna ser ziman û daxwaz dikir û digot: “Bila dayîkên Kurdistanê zarokên xwe bi heşt kurdperwerî û netewî perwerde bikin.

Dr. Şerefkendî her wekî çawan her bixwe amade bû serûmal, jiyana û xweşiya xwe fîdayê gelê xwe biket, berdewam ew şîrete jî dikir ku mirovê şoreşger yan dibe derwestbûna di nav şoreşê de hilbijêre, yan divê biçe bikeve bi dû jiyana xwe ya şexsî re.

Ew mirovekî şoreşgêrê rastîn, sadiq, di mudîriyet û birêve-



milê tevgerê û pêşmerge û çawan bikare bandorê li ser xelkê dabinê, da ku ew jî xwe xwedî erk bizanin û beşdariyê bikin, her lewma ku em dibînin piştî derbasbûna çendîn salan bi ser şehîdbûna wî re, rêvîngên rêbaza wî bizavekê bi navê “Rasan” deşt pêdikin, ku hemen xwezî û armanca Dr. Şerefkendî dişopîne û dikare xebata çiya û bajêr, an ku xebata pêşmerge û xelkê bi hev re girêbide.

Ew rêberê jêhatî li ser wê baweriyê bûye, ku eger her şoreşek nekare xelkê tevlî şoreşê bike û bike şerîkê xwe, bê guman ew şoreş serkevtî nabe.

Wî rêberê mezin gelek cehd dikir ku aştî nasyonālîzma Kurdistan di Rojhilatê Kurdis-

beriya erkê xwe de micid û tund, di reftara xwe de xakî û xwe pêşmergeyekî bi prensîp dizanî, dev biken, xwedî soz, di exlaqê xwe de, dil paqij, deşt pak, rastbêj, di bawera xwe de siyasetmedarekî lêzan û akadimî ku hemî zaniyariyên xwe xîstibûne xizmeta doza şoreşê û çêkirina heşt netewepereştîyê.

Wî rêberê nemir ji hemî serwet û heyîya dinê, dema şehîdbûnê, tenê ew hewcehî hebûn ku pêşmergeyek dikare hebe, weke kinc, solik û radyoyek.

Her lewma ew bi wan taybetmendiyên xwe îro ji bo rêvîngên emegdar yên xwe, pêşmerge û xortên azadîxwaz re bûye “ulgo” û rêbaz û bi kar û kiryar û hizr û şîretên xwe cem gelê me zindî ye.

Ez û gorbeheşt Şerefkendî çend sietan berî şehîdbûna wî bi hev ra bûn



N: Têmuurê Xelîl

Hinek bûyer hene, ku meriv naxweze û nikare derheqa wan da binivîse.

Yek ji wan bûyeran ew e, ku berî 28 salan, van rojên payîzê ez li Kölnê çend rojan bûme mêvanê serekê KOM-KAR a Merkezî Mehmet

Şahîn. Rojekê jî, 16ê îlona sala 1992an M. Şahîn gote min, ku îro Sekretêrê Partiya Demokrata Kurdiştana Îranê Dr. Sadiq Şerefkendî, nûnerê partiya wî yê Ewropayê Fattah Abdolî, nûnerê partiye yê Almaniyayê Humayum Ardalan wê bèn mala wî û şevê bibine mêvanê wî.

Me êvara wê rojê hev dît, hev nas kir, dû ra min texmîn kir, ku karê wan yê rêxistinî bi hev ra heye, ez çûm mala hevlekî din razam.

Berî çûyînê M. Şahîn ji min ra got: -Sibê em hemû bi hev ra diçine Bêrlînê, eger dixwezî, tu jî bi me ra were. Min got na, ezê herime Fransayê, mêvanê Înstîtûya Kurdî ya Parîsê me.

Min nizanibû, ku piştî rojekê wê li Bêrlînê wan hersê mêrxasên gelê me bi destî rêjîma Îranê ya faşîst gullebaran bikin, û ezê piştî çend rojan dîsa wana "bibînim" û xatirê xwe heta-hetayê ji wan bixwezim, vê carê li Înstîtûya Kurdî li Parîsê, ku xatirxweştin û binaxkirina wan hersê mêrxasan organîze kiribû.

Ruhê wan li buhuştê, li Goriştana Parîsê a kesên di cihanê da binavûdeng Cimetiêre du Père-Lachaise ye. Ruhê wan şad be û Xwedê mezin behsa serxwebûna Kurdiştana Mezin bi wan va eyan bike.

Bi hilkefta 26ê Xermananê salvegera terorkirina Dr. Sadiq Şerefkendî, HAK-PARê peyamek belav kir

Bi hilkefta 26ê Xermananê 28emîn salvegera terorkirina rêberê navdar, Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî di welatê Almaniyayê de ji aliyê rejîma terorîst a Îranê ve Partiya Maf û Azadiyan "HAK-PAR"ê, peyamek belav kir.

Deqa peyamê bi wî awayî ye:

Bi yada Dr. Sadiq Şerefkendî

Îro 28emîn salyada şehîd Dr. Sadiq Şerefkendî ye.

Dr. Şerefkendî di sala 1930an de li Rojhilatê Kurdiştanê, li bajarê Bokanê hatiye dinyayê. Dr. Sadiq Şerefkendî, zanîyar, şoreşger û welatperwereke bijare bû. Malbata Dr. Şerefkendî gelek welatperwerên bi nav û deng perwerde kirine. Dr. Sadiq birayê helbestvanê netewî Abduerahman Şerefkendî, an ku mamoste Hejar e. Mamosta Hejar ji alî serkomarê Komara Kurdiştanê nemir Qadî Mihemmed ve wekî "helbestvanê netewî" hatibû xelatkirin.

Piştî ku Dr. Qasimlo bi destê sîxûrên rejîma terorîst a Îranê di 13ê Tebaxa sala 1989 li Vîyanê hate şehîdkirin, Hizba Demokrat bi roh û canê nû, kongreya xwe di dawîya sala 1991an de civand û di kongreyê de vê carê jî, dokturek din, Dr. Sadiq Şerefkendî wek sekreterê giştî hilbijart.

Doktor Sadiq Şerefkendî li ser kimyayê doktora xwendibû û di sala 1972an de ji bona dokurayê çûbû Fransayê. Piştî salak, yanî sala 1973an li Parîsê bi Qasimlo re hevnasîyê kiribû. Dr. Şerefkendî, di zankoyeke herî navdar "MARIE CURIE" de, di warê "analitik Kimya"yê tezek amade kiribû û sala 1976 tez hatibû qebûlkin. Piştî Dr. Şerefkendî wek doktor hatibû Kurdiştanê û tevî refên Hizba Demokrat a Kurdiştana Îranê bibû. Dr. Şerefkendî di sala 1980an de wek endamê Komîteya Navendî a Hizba Demokrat di kongre de hate bijartin û Komîta Navendî Şerefkendî wek endamê deftera sîyasî (polit büro) hilbijart û wate dar kir.

Tê zanîn ku HDKÎ endamê Enternasyonala Sosyalişt e. Doktor Sadiq Şerefkendî ji bona beşdariya civîna Enternasyola Sosyalişt a sala 1992an ku li paytextê Almanya Bêrlînê civîya bû, li Bêrlînê bû. Piştî ku civîna Enternasyonala Sosyalişt dawî pê hatibû, Şerefkendî xwestibû ku bi opozîsiyona dijber a Îranê re jî, hevdîtinekê pêk bîne. Lewra digel opozîsiyona dijberê Îranê xwestibû ku li ser pirs û qedera gelê Kurdiştanê û xelkê Îranê gengeşe bikin.

Dr. Şerefkendî digel nûnerê

Ewropayê HDKÎ Fettah Ebdûlî û nûnerê Almaniyayê Hûmayûn Erdelanî beşdarê civînê bun. Bi wan re dijberê rejîma Îranê Nûrî Dêhkurdî jî hebû.

Berê qerar hatibû dayîn ku wê civîn roja 18an çê be. Lê paşî dema civîn rojek berê, yanî roja 17ê Îlona sala 1992an pêk hat. Cihê civînê reştoranta binavê "Mykonos" bû ku ji aliyê yekek Îranî ve li Bêrlînê dihate şixûlandin. Li ser masa civînê 8 kes hebûn. 4 kes ji endamê opozîsiyana dijberê Îranê û 4 kes jî di heyeta HDKÎ de cîgirtibûn. Hê di destpêka civînê de terorîstên Îranê hatin û raşterast qeşa heyeta HDKÎ kirin û her sê rêveberên Hizba Demokrat gullebaran kirin.

Qatil, li ser wan brîndaran man heta ku ew can bidin. Her kuştîyek kişandin goşeyekê salonê û termê wan jî gullebaran kirin. Paşê reştoran bi cih hêlan û revîn. Balkêş e ku di vê kiriyara terorîstî de bi sedan gulle hatin avêtin. Li ser maseya civînê 8 kes hebûn, lê tenê sê Kurd hatin kuştin. Eşkere ye ku sîxûr û ajan jî, li wê derê amade û serkar bûn. Helbet sîxûr û xwefiroşan rapor dabûne terorîstan ka kî li kuderê, li kîjan aliyê rûniştîye. Bêguman ew ajanê

xulamok û hevkarê rejîma xwînrejî a Îranê bûn. Ew kes bûn ku haya wan jî vê hevdîtîne hebû û gelek bi başî û hûrkarî agadarê civînê bûn.

Careke din hate dîtîna ku Kurd hewce ye li ser şîreta Qazî Mihemmed bisekînin û wê şîretê tu carî jibîr nekin:

"Ji nav dîjminên mîletê Kurd yê herê dijwar Ecem in. Ecem ji tewan zalimtir û melûntir û Xwedê nenasîtir û bê dilovanîtir in. Destê xwe ji tu tawanên li dijî gelê Kurd nakêşin. Ecem, di dirêjahiya dîrokê de, bi gelê Kurd re xerez û kîna wan a kevnar her hebûye û her niha jî heye."

Em wekî Partiya Maf û Azadiyan terorkirina Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî bi tundî şermezar dikin.

HAK-PAR rêz û hurmeta xwe pêşkeşî hemû şehîd û rêberên Kurdiştanê dike.

Bimre rejîma Îranê ya zordest û dijberê mîletê Kurd

Bijî Azadiya Kurdiştanê

17ê Îlona 2020

"Latif Epözdemir"

Serokê Giştî yê Partiya Maf û Azadiyan "HAK-PAR"

Nerîna Lîderan



“Donald Trump”:
“Em îzin nadin ku rejîma Îranê çeka navikî hebe û bi mûşekên balêstîk gefê li cîhanê bixwe”.



“Mişel Ewin”:
“Dewleta Lubnanê ava nebe, dê ber bi cehnemê ve here”.



“Mike Pompeo”:
“Rejîma Îranê piştevanê terorîzmê di cîhanê de ye”.



“Eli Xamneyî”:
“Şerê di navbera Îran û Îraqê de aqilanetirîn rûdawa dîrokê bû”.

Ew kesê ku Dr. Qasimlo şande Ewropa, ew jî hate şehîdkirin

Werger ji Tirkî bo Soranî: Bekir Şiwanî
Ji Soranî bo Kurmancî: Sîbel Xubayî

Pêwendiya navbera Mûsa Enter û Dr. Abdulrehman Qasimlo;

Min du ciwanên Kurd ên xelkê bajarê Ormiyê nas kirin ku li bajarê Îstenbolê ders dixwendin. Hisên Qasimlo di beşa navxwe ya zanîngeha teknîkê de him li wir dima û him ders dixwend. Herwisa Ehmed Qasimlo jî li zankoya pizîşkiyê ders dixwend û di beşa navxweyî de ku min ew damezirandibû, dijiya.

Heke şaş nebim sala 1945'an bû, rojekê Hisên, ciwanekî gihayî û çavgeş û jêhatî anî cem min û got: Kekê Mûsa, ew jî Abdulrehman e. Ev birayê me yê biçûk e.

Wê salê Abdulrehman li Îranê, qonaxa destpêkî qedandibû û bo domandina xwendinê hatibû wir. Ciwanekî çeleng û jêhatî bû. Ji ser û rûyê wî, germiya hêza civakê dikeliya. Birayên din ên wî wekî wî nebûn. Abdulrehman zêdetir bala xwe dida aliyê hunerê û dixwest li zankoya wêje (Edebiyatê), beşa civaknasî (sosyolojiyê) bixwîne.

Li wir de min navê wî nivîsî û ew ji wê demê ve li beşa navxwe ya min, dima. Piraniya wan deman ku ders nedihat gotin, Abdulrehman dema xwe ligel min derbas dikir.


Dilê wî ji bo Kurd û Kurdistanê dişewitî. Piştî nêzî 5 mehan êdî ew beş li zankoya edebiyat nema û wî ji nû ve dest pê kir. Carna ku derfet çê dibû, ji min re digot ku dixwazim herim Ewrûpayê. Wê serdemê, roja Înê ya hemû mehan diçû mala xatûn Meziyet a xwîşka Kameran Bedirxan li taxa Şîşî ya bajarê Îstenbolê û li wir di riya telefûnê re bi Kameran Bedirxan re dikete pêwendiyê. Wê demê Kameran li bajarê

Parîsê dijiya.

Rojekê min behsa hezkirin û şiyane wî ciwanî ligel Kameran Bedirxan kir. Wî got: “Ser seran û serçacvan. Ew jî her wek kurê min e û wî bişîne vir. Ezê li vir borsekê terxan bikim”.

Dema min ew mizgînî da Abdulrehman, ew pir kêfxweş bû. Lê gote wî: “Min mercek ji bo te heye, hekî her 2 birayên te yên mezin razî bin, wê demê tu dikarî herî...” Abdulrehman bi van gotinan wek agir, germ bû.

Ebdulrehman di heyameke kurt de navê xwe ji zankoyê rakir, belgeyên xwe amade kirin û me ew ji wêstgeha “Sîrkeci” ber bi Ewrûpayê rê kir. Bêşik Şerê Cîhanî yê Duyem bi dawî hatibû. Eger em dêna xwe bidinê, Abdulrehman jî li ser vê bîr û bawerê bû, lê Dr. Abdulrehman ji min bi mifahtir bû, çimkî mirina wî şerefmendane bû. Wey ezê çiqasî bextewer bim ku mirina min jî wek mirina Dr. Qasimlo be ku bi gorî welat bim û şehîd bim. Niha Dr. Qasimlo di nav gelê xwe de wek ala li esmanan diheje.



Her heman êwarê, Abdulrehman, her 2 birayên xwe yên mezin anîne cem min. Her 2 razî bûn, lê wan got ku me perê hewce niha tunîn e û emê nameyekê bişînin Îranê û pişt re bo Abdulreham bişînin Ewrûpayê. Min got: “ez pere ji we naxwazim. Ew pere bila li sitûyê min be. Hekî ew birayê we ye, birayê min e jî”.

Lê eva tiroпка şeref nîne!

Çavkanî: pirtûka “Bîranînên min” a Mûsa Enter.

Têbînî: Mûsa Enter çend mehan piştî terorkirina Dr. Abdulrehman Qasimlo, ev bîranîn nivîsiye. Rojgar hat û ew jî roja 20'ê Sêptabrê ya sala 1992'an di temenê 72 saliyê de bi destê çeteyên dewleta Tirk hate terorkirin.



Kurdiştan di navbera raporta NY û serdana nûnerê Amerîkî de



N: Ebdulazîz Qasim

Piştî zêdebûna çavdêriya Amerîkî û Fransiyayê bi ser danûstandinên Kurdî-Kurdî de, û pêkanîna çend xalên girîng û erênî ber bi timamkirina lihevkerina Kurdî-Kurdî, û rêkeftina ENKS'ê û PYNK'ê li ser damezrandina "Encûmena Lêvegera Kurdî" li gorî xalên rêkeftina Duhokê 2014-an, tevî zêdebûna têkiliyên Kurdan digel hin part û aliyên Erebi û Asûrî, wekî avakirina Eniya Azadî û Aştiyê di navbera ENKS û hin eşîretên Ereban û Siryan û Tevergera Aşûrî de, û îmzekirina girêbesta berhemhêna petrola kilîngehên Hisiçe (Hesekê) di navbera kompaniya neftê ya Amerîkî "Delta Crescent Energy" û "HSD" de, di 20.10.2020'an de, ev girêbest wê bikeve di warê cêbicêkirinê de.

Li beramberî zêdebûna çavdêriya Amerîkî û herwiha ya Rûsyayê jî bi pirsra Kurdî li Kurdiştana Sûriyê, ku ev yek bû cihê nerazîbûna neyarên doza Kurdî, bi taybetî opozisyona Sûrî (îtîlaf) ya ser bi Tirkîyê ve, ku jî aliyê serokê "îtîlafê" bi awayekî aşkere dijminatîya xwe bo gelê Kurd diyar kir, û di roja 05.09.2020'an di nameriyê de hişyarî da Komkara Dewletên Erebi li hember hewldanên "parçekirina Sûriyê û avakirina statuyek Kurdî", li gorî zanyariyan ku ti bersiv ji aliyê komkara dewletên Erebi nehatiye dan, berevajî ku dibe di demeke nêzik de ku hin dewletên Erebi wekî Misr û Erebiştana Siûdiyê helwestên tund li dijî van gropên ser bi Tirkîyê ve biştînin, ji ber beşdariya wan di şerê Libya de, hevdem ku piştguhxiştina nameya serokê Îtîlafê ji aliyê Komkara Erebi

ve wekî deştkeft ji bo doza Kurdî tê hesabkirin.

Li aliyê din ku tawanên çeteyên opozisyonê li Efrînê û Serêkaniyê û Girêspî zêdetir dibin heta gihîşt ku yek ji çeteyên opozisyonê bi navê "Abo Omar" daxwaza qirkirina gelê Kurd li Efrînê kir û feteweyek bi kuştina gelê Kurd da û got: (divê Kurdek bi tenê jî li Efrînê nemîne), digel zêdebûna hewldanên wê li dijî ENKS'ê bi dûrxistina endamêkî Kurd ji deştaya danûstandinê ya "Jinêv"ê, bi birîn û qutkirina ava vexwarinê li ser bajarê Hisiçe (Hesekê)..., heta ku jî aliyê Komisyona Lêkolînê ya ser bi NY di raporteke nû de ku li roja 15.09.2020'an hat belavkirin û tê de "milîsên ser bi Tirkîyê ve bi tawanên şer li dijî welatîyên Kurd li bakurê Sûriyê tawanbar kirin".

Serokê Komîsyonê "Paulo Pinheiro" hefteya borî ragihand: "ku li Efrîn, Serêkaniyê û deverên derdora wan, Artêşa Nîştîmanî ya Sûriyê ku ser bi Tirkîyê ye, tawanên şer encam dane, û xelkê herêmê barimte girtine, û bi tawanên revandin, îşkencekirin, deştirêjiya cinsî û talankirina mal û milkan tawanbar kirine, û daxwaz ji Tirkîyê kiriye ku van tawanên rawestîne". Di demê de ku hiqûqnasên Kurd vê raportê wekî deştkeftê dibînin, lê navdartin hiqûqnasê



Sûrî Ramî Ebdulrehaman serokê "Rewangiha Sûrî ya Mafên Mirov" dît ku "ev raport kême, jiber ku dewleta Tirkîyê ya dagîrker bi awayekî raştêraşt tawanbar nekiriye".

Piştî du rojan ji belavkirina rapora Komisyona Lêkolînê ya NY li ser Sûriyê, Komîsera Bilind ya Mafên Mirovan ya NY, "Michelle Bachelet", di daxuyaniyê de, hişyarî da li rewşa xirab ya mafên mirovan li deverên di bin dagîkeriya Tirkîyê de, û nîşan da ku bi awayekî berbiçav binpêkirinên mezin, kuştin, revandin, guhertina demografî û deştserkirinê erd, mal û koçberkirina bi zorê rû didin".

Komîsera Bilind ya NY kuştina 116 sivîlan piştraşt kir, di nav de 15 jin û 20 zarok, û nîgeraniya xwe anî ziman li ser qutkirina ava vexwarinê li ser bajarê Hisiçe (Hesekê) û bikaranîna avê wekî çekên şer nemaze digel belavbûna nexweşiya Koronayê.

Tevî ku her du raportên NY, bi kêmanî behsa tawanên kiriye, lê di heman dem de, ev belge û dokument wê ji bo pêşvebirina doza Kurdî li ser astê mirovî û siyasî bi kar bihêt, hevdem ku ev yek digel serdana nûnerê taybetî yê Amerîkî ji bo Sûriyê "James Jeffrey" bû, li roja Yekşemiyê 20-ê Îlonê li Kurdiştana Sûriyê, ji bo dîtina Partiyên Kurdan, nemaze ENKS û PYD bi armanca bi dawîkirina duyemîn gera danûstandinê û gihîştina rêkvevtineke siyasî, leşkerî û rêveberî ya yekgirtî ji bo rêvebirina devera Rojhilatê Firatê. Ev serdan bixwe dikeve xizmeta doza Kurdî û bideştixistina mafên rewşa yê gelê Kurd di Sûriyê de.

2 mamostayên gundê Memekan li devera Soma û Biradostê, bi nexexiya koronayê ketine

Piştî vebûna dibistanan di gundê "Memekan"ê li devera "Soma û Biradost"ê de, 2 mamostayên wî gundî tûşî vîrûsa koronayê bûne û di wê dibistanê de jî çendîn xwendevan hebûne.

Roja Yekşemî, 20ê Îlonê, 2 mamostayên dibistana gundê "Memekan"ê li dervera "Soma û Biradost" a girêdayê bajarê Urmîyê, tûşî vîrûsa Koronayê bûne ku bona çareserkirin dermanî bo navendên pizîşkî hatine veguhestin, di wê dibistanê de bi 10an zarok mijulê perwerde û hînkariyê bûne.

Tevî hişdariya pisporên pizîşkiyê, Wezareta Perwerde

û hînkariya rejîma Îranê biryar dabû ku xwendîngê û dibistan di demsala nû a hînkari û perwerdeyê de deşt bi karê xwe bikin lê, emrazên hewce û kelûpelên hewce bona xweparastin ji tûşbûn bi vîrûsa koronayê bo wan dibistan û xwendîngêhan dabîn nekiriye.

Ew 2 mamostayên dibistana "Memekan"ê ku xelkê deverên "Sîlwana û Tîrgewer" in, tevî pêketin bi vîrûsa Koronayê rege bi 10an zarokên din jî tûşî wê vîrûsê kiribin.

Di wan dibistanan de ti emrazekî dijegendkirin û parastin ji tûşbûn bi vîrûsa Koronayê tinînin.




Navendên ewlehî yên rejîmê givaşan dêxine ser malbatên çalakvanên siyasî

Îdare û navendên ewlehî yên rejîma Îslamî a Îranê bi mebešta givaşxistin li ser malbatên hepsiyan siyasî û herwisa Pêşmergên Kurdiştanê, mifahên xirab ji nasnameyan endam yên malbatên wan kesane werdigrin.

Li gor ew zanyariyan ku gihîştine malpera "Kurdiştanmedia"yê, di bajarê Seqîzê de navendên Îtila'atî yên rejîmê bi mifahwergirtin ji nasnameyan wan

kesên ku welatê xwe bi cih hiştine, karûbarên îdarî pê dikin û piştî pirsgerikan bo malbata wan çê dikin.

Karbideştên rejîmê bi nasnameya wan kesane deşt bi karûbarên bazirganî dikin, dukanan û pasajan diruşt dikin û piştî îdareya malyatê bi navên wan kesane bo malbata wan fişa bacê dişîne ku heyama çend sal e bac nedane û pirsgerikan bo wan diruşt dikin û hêcetan ji wan



digrin. Herwisa gefan ji malbatên wan kesên siyasî dixwen ku ji hegera nedana bacê dê wan radeştî dadgehê bikin.

Armanca sereke ya rejîmê ji wan karan eva ye ku arîşe bo malbatên çalakvanên siyasî çê bike.

Xelkê şehreka Şahid a Urmîyê nerizayetiyan xwe nîşan dan

Piştî kolandin û danîna boriyan avê li kolanan Faza 1 a şehreka "Şahid" a bajarê Urmîyê, paşmaweyên wan kolandinan di nava kolanan de maye û bajarvaniyê jî ew kolan qîr nekirine.

Roja Şemî, 19ê Îlonê, xelkê faza 1 ya Şehreka "Şahid" di bajarê Urmîyê de ji qîrnekirina kolanan û pîrnekirina wan çalan ji aliyê bajarvaniyê re nerizayetiyan xwe nîşan dane

Ew paşmaweyên danîna boriyan avê di wê şehrekê de bûye sedema nerizayetiya

wî xelkî û xelk hebûna xa û herî di kolanan de, hevahengnebûna bajarvanî û şirketa Av û Averoyê dizanin.

Li ser wê mijarê, berpîrsê şirketa Av û Averoyê ya parêzgeha Urmîyê, "Elîrîza Rezewî" gotibû: "Heta niha ti daxwazkariyek ji aliyê bajarvaniyê ve derheq qîrkirina kolanan Faza 1 a şehreka "Şahid" ji me re nehatiye kirin ku bersiva wan bidin.

Kolandinan rêyên qîrkirî di bajarê Urmîyê de bi salane ku her hebûye û sedema wê



hevahengiyê jî bajarvanî û şirketa Av û Averoyê ye.

Seîd Veroj lêkolînek li ser rêxistina Hêvî û kovara Rojî Kurd çap kir

Nivîskarê Lêkolîner Seîd Veroj, xebata xwe ya li ser kovara Rojî Kurd ku ji aliyê yekemîn rêxistina ciwanên Kurd, Cemiyeta Hêvî ya xwendekarên Kurd ve hatiye weşandin, duyemîn car û tamamkirî çap kir. Veroj balê dikşîne ku ji ber nebûyîna dewleta Kurd, paşxane û arşîva Kurdan jî qels maye û xebatên lêkolînê jî gelek zehmetî û derfetan dixwazin. Lê dildarên nasname, çand û kelepora Kurdî, hewla berhevanîna bîra Kurdî bi berde-wam didin.

Lêkolîner Seîd Veroj, Xebateke nû ya li ser Cemiyeta Hêvî ya Telebeyên Kurd û Kovara ku weşandine, Rojî Kurd, ji bo baldar û xwînerên Kurd çap kiriye. Seîd Veroj yekem car 3 jimarên Rojî Kurd di sala 2002'an de diweşîne. Lê piştî ku hêjmara dawî jî bideşt xistiye, lêkolînên xwe yên li ser rêxistina Hêvî û 4 jimar-eyên kovara Rojî Kurd, bi pêşgotin, ravekirin û wergera Kurdî jinûve çap kiriye.

Seîd Veroj tîne ziman ku lêkolînên Kurdî, li gel dewlemendiya dîrok, çand û erdnîgariya Kurdî gelekî qels mayîne û balê dikşîne ku ji ber dewleta Kurd nîn e jî, arşîvên Kurdî jî di arşîvên dewletên cida de ne û gihiştin û têgihiştina wan gelek zehmetî û derfet dixwaze. Veroj dîsa bale dikşîne ku bîra miletekî ji bo îro û siberoja wî miletî girîng e û em dibinin ku ew mijarên di Rojî Kurd de tîne gengeşî kirin, îro jî bi gelek aliyên xwe bi heman awayî ne.

Lêkolîner Seîd Veroj ji K24ê re got: "Dema ku em behsa Rojî Kurd bikin, behsa Cemiyeta Hêvî nekin, kêmasiyekî ye. Loma jî di yekemîn çapa me ya Rojî Kurd de, kêmasî mabû û dile min nerihet bû. Lê min di vê pêvajoyê de derfet dît ku li ser Cemiyeta Hêvî, cemiyeta xwendekarên Kurd ku yekemîn cemiyet e, bi navê xwe yê orjînal Cemiyeta Hêvî ya Telebeyên Kurd xebatekî, lêkolînek kir. Soraniya wî me car din li Hew-



lêre bi hevkarîya bîrez Nasir Huseyîn nûjen kir, Kurmançiya wî me sereraşt kir, her wisa Tirkîya Osmanî jî me dîsa ber çav de derbas kir. Bi vî awayî me ew çapa berfirehkiriya nû amade kir."

Xelîl Xeyalî, Qedri Cemîlpaşa, Fûat Temo, Zekî Efendî û Memdûh Selîm, di sala 1912'an de li Stembolê cemiyeta Hêvî ya Telebeyên Kurd damezrandine û


di 1913'an de jî 4 hêjmarên Rojî Kurd weşandine.

Seîd Veroj, radigihîne ku dema mirov teqrîben 100-110 berê li Rojî Kurd dinihêre, diibîne ku di wê serdema ku bîr û hêstên neteweyî şînbûbûn û netewedewlet dihatin damezrandin de, gengeşiya neteweperî û umetperwerî, osmanî perwerî hebûye û piştî sed salan

zêdetir jî hêj Kurd di nav wan gengeşiya da ne û li ser netewebûnê û netewedewleta xwe gengeşiyên dikin.

Lêkolîner Seîd Veroj dibêje: "Ev dema modern ya ku em tî de ne, pêvajoya temambûna neteweyî, bi avabûyîna dewleta neteweyî digihije qonaxa herî bilind. Lê Kurd ev jî 100 salî zêdetir e, li her çar aliyên Kuriştanê, gelek têkoşîn dane, lê mixabin ew têkoşîna berfireh hêj jî bi çêbûna dewleteke neteweyî ya Kurd negihîştîye encam. Ji ber vê yeke heta ku dewleteke neteweyî ya Kurd çênebe, netewetiya Kurd, dê her tim mijara gengeşiya çapamenî, nivîs û nivîskarên Kurd be û yên ji derveyî Kurdan be jî."

Nivîskarê lêkolîner Seîd Veroj heta niha damezrenêrî û edîtooriya 2 kovarên Kurdî War û Bîr'ê kiriye, dîsa deştaya pirtûkên zarokan (ji 6 pirtûkan pêkhatî) û 14 jî berhemên lêkolînê ku li ser dîrok, berhem û kesayetên Kurd kiriye hatine weşandin. RÛDAW



Binpêkariyên mafê mirov di Kurdiştanê de

Li deşpêka Îsal heta niha çend kolber ji aliyê hêzên rejîmê ve hatine kuştin?

Çend haletê canjideştdan û birîndarbûna wan hebûye?

Di malbatekê de çend kes bi karê kolberiyê hatine kuştin?

Çend mînakên din hene ku emê di vê raporê de pêşkêşê ve bikin.

Kuştin û birîndarbûna 143 kolber di heyama 6 mehên yekem a sala 1399'an a Rojî de

Li gor amara ku ji aliyê Saziya Mafê Mirov a "Kurdpa"yê ve hatiye tomarkirin, di heyama 6 mehên deşpêka sala 1399'an de, 143 kolber di Kurdiştana Îranê de hatine kuştin û birîndarbûn (37 kes hatine kuştin û 106 kes hatine birîndarbûn).

Kuştin û birîndarbûna wan kolbera bi wî awayê ye:

Teqa raşteraşt a hêzên leşkerî yên Îranê: 101 halet

Teqeya hêzên leşkerî yên Turkiyê: 13 halet

Berbûn ji bilindahiyên ve: 4 halet

Lêdar û îşkenceya kolberan ji aliyê hêzên leşkerî ve: 2 halet

Kevtina nav çem: 2 halet

Teqîna mîn: 1 halet

Kuştin û birîndarbûna kolberan di encama bûyerên hatûçûnê de: 19 halet

Ronkirina hindeke ji haletan bi wî awayî ne:

3 kes ji kolberan yên bi navên "Mubîn Husênî, Armîn Ehmedî û Manî Haşimî", temen 16, 17 û 14 sal bû ne.

Kolberê kuştî, "Sirac Ehmedî" ku li 25'ê Gelawêja îsal, bi teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê ku li ser sînorê ba-



jarê Urmîyê hatibû kuştin, sêhimîn kolberê malbata "Ehmedî"yan bûye, pêştir û li sala 1399'an, du kurmamên wî kolberê yên bi navên "Erselan û Şemzîn Ehmedî", bi teqeya hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê ve hatibûne kuştin.

Rêketa 5'ê Gelawêjê, "Armîn Ehmedî" kolberê temen 17 salî û xelkê bajarê Merîwanê, di encama teqeya hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê hatibû birîndarkirin, hêzên leşkerî navbirî bi birîndarî bi cih hêlabûn.

Rêketa 16'ê Xermananê, "Manî Haşimî" kolberê temen 14 salî û xelkê gundê Şemşêr a ser bi bajarê Paweyê ku bo kirîna telefonê çûbû bo kolberiyê, di encama berbûn ji bilindahiyê ve bi awayekî dijwar birîndar bû.

Rêketa 23'ê Xermanana sala 1399'an, "Selahedîn Îsazade" kolberê xelkê bajarê Şinoyê ku piştî lêdan û îşkenceyê ji aliyê hêzên leşkerî ve, piştî dabûne ber gulleyan û navbirî kuştin.


Agirî

- ◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (382)



Şerefkendi rêvîngê rêbaza Qasimlo



Dezgeha Giştî ya Ragihandina PDKî